

Xizmetên ji bo Bikarhênerên Pirtûkxanê

Her kes dikare pirtûkxanê belaş bikar bîne.

Pirtûkxana Bajarê Qulu li pirtûkxana sereke û li pirtûkxanên taxên cûda dişoxile.

Pirtûkxana mobîl tê serdana derûdorên ku lê pirtûkxane tune.

Hûn dikarin li pirtûkxanê kovaran yan jî pirtûkan bixwînin yan jî wan bi deyn bistînin û bibin malê.

Hûn dikarin xêvjîmêrekî û Înternetê jî bikar bînin.

Pirtûkxane xizmetê dide zarokan, ciwanan û mezinan.

Li pirtûkxanê her cûre (celeb) materyal hene:

- pirtûkên nepevbestîn (nefîksiyonî)
- roman, pirtûkên helbestê û pirtûkên biwêne
- karîkatûr
- rojname û kovar
- CDyên muzîkê
- muzîka bêberg (muzîka li ser pelan)
- filmên DVD
- kursên zman
- CD-ROM
- pirtûkên bihîstwer (pirtûkên ji bo guhdarkirinê).

Li pirtûkxanê materyalên bi zmanê Fînî, Swêdî, Îngilîzî û bi gelek zmanên din hene. Li pirtûkxanê bi zmanê we jî pirtûk hene.

Hawê karanîna pirtûkxanê

Hûn dikarin di pirtûkxanê de agahiyan bixwînin, bibînin yan jî xêvjîmêrekî bikar bînin.

Hûn dikarin di beşa muzîkê de li muzîkê jî guhdar bikin.

Pirtûkxane ji bo xwendin û xebatê wargehekî biaram e. Bikarhênerên din ên pirtûkxanê aciz mekin.

Ji personelê pirtûkxanê alîkariyê bixwazin. Ew ê ji bo karanîna pirtûkxanê ji we re bibin alîkar. Ew ê ji bo lêgerîn û dîtina materyalan yan jî agahiyan jî alîkariya we bikin.

Bideynstandin

Hûn dikarin pirtûk û materyalên din jî ji pirtûkxanê bi deyn bistînin.

Hûn hewcê qertekî pirtûkxanê ne, da ku hûn materyalekî ji pirtûkxanê bi deyn bistînin. Kesekî ku li Finlandiyê dijî, dikare qertekî pirtûkxanê bistîne. Gava ku hûn pasaporta xwe yan jî nasnameye xwe şanî personelê pirtûkxanê bikin, hûn dikarin qertekî ji wan bistînin.

Ger hûn kêmî 18an bin, hûn ê hewce bin ku destûrek ji dêkî, bavekî yan jî parêzgerê bigirin.

Bêyî qertekî pirtûkxanê, hûn nekarin materyalekî ji pirtûkxanê bi deyn bistînin. Gava ku hûn hatin serdana pirtûkxanê, qerta pirtûkxanê ji xwe bîr mekin û wê bi xwe re bînin.

Hûn dikarin ji pirtûkxanevan yan jî bi karanîna makîna ku bi deyn dide materyalekî bi deyn bistînin.

Qerta pirtûkxanê şexsî ye. Destûr tune ku kesên din qerta we ya pirtûkxanê bikarbînin. Hûn ji materyala ku li ser qerta we bi deyn hatiye standin berpirsiyar in. Ger hûn qerta xwe winda bikin yan jî bar bikin navnîşanekî din, xwe ji bîr mekî bi pirtûkxanê bidin zanîn.

Demdiyara deyn

Demdiyara deyn ji bo pirtûkan bi gelemperî çar hefte ye. Çêdibe ku demdiyara deyn ji bo muzîk û filmên DVD û CD-ROMê kurtir be.

Hûn ê ji bo materyala ku hûn bi deyn distînin, girtekekî (vîtik) bigirin. Girtek materyala ku we bi deyn girtî û roja ku divê materyal li pirtûkxanê were paş vegerandin dide zanîn. Ger hûn materyala bi deyn hatî girtin ji wê roja ku li ser girtê hatî nîşan kirin derengtir paş de vegeftin, pêwîst e ku hûn mûçeyekî bidin pirtûkxanê.

Hûn dikarin materyalê dirêjtir bi deyn bistînin, ku hûn telefonê pirtûkxanê bikin yan jî materyalên ku we bi deyn standî li ser internetê nû bikin. Ger hûn dixwazin materyalên ku li ser we bideyn e, nû bikin, ji we re şifreyekî hewce dike. Hûn dikarin şifreyekî li pirtûkxanê bistînin. Ger materyal ji alî kesekî din ve hatibe girtin, hûn nekarin deynê xwe nû bikin.

Materyal paşvegerandin

Hûn dikarin materyalekî, kijan dibe bila bibe, li pirtûkxaneyekî Bajare Qulu paş da vegeftin. Di paşvegerandina materyalan de qerta we ya pirtûkxanê hewce nake.

Materyal rezervkirin

Ger pirtûkekî yan jî materyalekî din ji hêla kesekî din ve bi deyn hatibe girtin, hûn dikarin li pirtûkxanê yan jî li ser internetê wê rezerv bikin. Gava ku ew materyal amade be, pirtûkxane dê altaxînameyekî ji we re bişîne. Mûçeya rezervkirinê ji bo rezervkirina materyalan tê standin.

Bûyerên li pirtûkxanê

Pirtûkxane ji bo xerîdarên xwe pêşangeh û bûyeran li dar dixe.

Ger hûn di derheq bûyeran de hîn zêde agahdariyê dixwazin, ji pirtûkxanê bipirsin yan jî malpera pirtûkxanê bixwînin: www.ouka.fi/kirjasto.

